

CEGERXWÎN

SALAR Û MÎDYA



MED

CÎGERXWÎN

SALAR Û MÎDYA

**WEŞANÊN
MED**

Birinci Baskı: MeD yayınları, ekim 1991 İstanbul.
Baskı : Aydınlar matbaası, Tlf.544 76 29-30.
Dizgi : Heval Dizgi Tlf. 513 53 74.

Yönetim yeri ve Yazışma adresi.

**MeD Yayıncılık Ltd. Őti.
AlaykōŐkū cad. Sıdıkā Batu İŐhamı 12/5
Tlf: 511 52 93. Fax:513 60 41
CaĐaloĐlu/ İstanbul.**

JÎYANA CÎGÉRXWÎN

Dengbêjê azadî û serxwebûna yê gelê Kurd, hozan û nivîskarê mezin, lîteraturvan, dîrokvan, filozof û polîtîkvanê înternasyonalîst, di sala 1903 da li bajarê Merdînê, nehîya Amûdê, gundê Hesarê hate dinê. Navê wî yekhemcar Şexmus Hesen hate danîn. Navê Cîgerxwîn wî paştta jîyana nivîskarîyî xwe da girtîye. Dema ku Cîgerxwîn hîna mindale, bavê wî diçe ser heqîya xwe, salekî piştî mirina bavê wî, dayika wî jî ji ber perê felekê xilas nabe û ji dinyayê koç dike. Cîgerxwîn sêwî dimîne; di nav jarî, belengazî, xizanî û tengasîyek da mezin dibe. Ji ber vê sedemê cîgera wî dişewitî, kwîla wî mezin dibe. Serda jî kirinên dewletên dacîkird êş û derdê wî herçî çû zêde dikin, kezew û dilê wî xwîngîrî dikin. Ji ber vê yêkê destpêkî nivîsandinê dike, navê CÎGÉRXWÎN lê tê danîn, ew jî vî navî digire. Lê xwedî derdikeve. Cîgerxwîn di zarotî û xortanîya xwe da, bona berdewamkirina jîyana xwe li gel axa, beg û sermayedaran şivanî û karkirîya erçinînê dike. Di vê demêda zelp, zilim û kedmîtina feodalîzmê baş nasdike. Mindalî û cehalîya Cîgerxwîn derdora nehîya Amûdê û gundê Hesarê derbaz dibe.

Cîgerxwîn di 18 salîya xwe da; di medresek Kurda destpêkî zanyarîya olî dike. Xwendina wî 10 sal berdewam dike û dibe mele. Cîgerxwîn di xortanîya xwe da ji rojhilat heta rojava, ji bakur heta başur li hemu navçeyên Kurdistan digere, bajar, nehîye û gundên Kurdistan nas dike. Cîgerxwîn di sala 1924' da destpêkî nivîsandina helbest û şêrên dike. Şêr û

helbestên wî ekserîyet dijî nîr û kedmîtina feodalîzmê bun. Seydayê mezin Cîgerxwîn di şêr, helbest û nivîsên xwe da jîyana xelkê Kurdistan, daxwezî, hêvî û tekoşîna netewî ya milletê Kurd hostetî tîne ser ziman, rêgaya rizgarbunê netewa Kurd nîşan dide, dengê xwe dijî nijadpereztiyê û neheqiyê bilind dike." Dema ku faşîzme wekî zilmatek tarî dikeve ser cîhanê, Cîgerxwîn di refên milletên jêrdest û sosyalîst da cîhê xwe digre, penûsa xwe dijî faşîzmê, împeryalîzmê û neheqîya nijat perestên elman şer dike."

Cîgerxwîn ne tenê nivîskarê hêja bu, ew politikvanekî giranbiha jî bu, wî her tim rêxistin û tenzîmkirina milletê Kurd parazt, xwe jî tenzîmkirî ma. Cîgerxwîn di sala 1927 zewicî, di wan salan da li gel braderên Bedirxan û hînek rewşenbîrên Kurd ên din endemê sazumana Xoybun bu. Û bona derçuyîna kovara Hewar xebitî. Wî kowara Hewar da her tim nivîsê, ew:

Ji tenzîmkarê Hewarê yek bu. Cîgerxwîn di sala 1937 da li nehîya Amudê bona xort û keçên Kurd qursa xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî vekir. Gelek xort û keçên delal hînbuna xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî kir, di fikir û ramanên wanda bingeya ramanên dijî kolonyalîzmê, netewî û welatparêzî danî, xwenasîna netewî û şoreşgerî weku çekike da dest wan. Li piştî şerê alemê yê duem, Cîgerxwîn li gel ronakbîrê Dr. Exmed Nazîf Beg û hînek şaxsiyetên Kurd yê din, li Cizîrê Sazumana Azadî û Yekîtîa Kurd damezrand. Dr. Exmed Nazîf Beg bu serokê wê rêxirawê, Cîgerxwîn jî sekreter. Ew Sazuman paşt a bu liçekî Partî Demokratî Kurdistan ku li Rojhilat û cenubî Kurdistan xebat dide, tenzîm dibe û şerê azadî û rizgarbunê dijî quwetên dacikird dajoy. Di salên 1949-1957 da Cîgerxwîn bu endamekî aktîv yê Partî Qomunîstî Suriya. Di sala 1957 da Cîgerxwîn damezrandîna Partî Demokratî Kurdistanî Suriya da cîh girt û bu endamê Qomîta Nawendî yê vê partiyê. Di sala 1959 da Danîşgah Bexdadê, di Besê Kurdî da dersên zmanê Kurdî da.

Partîya ku Cîgerxwîn nonerê Qomîta Nawendî bu; pašta navê xwe gorand û navê Partîya Demokratên Pêşwerûyen Kurd li Surîyê girt. Cîgerxwîn heta ji me xatirê xwe yê ebedî xwest û çavên xwe li wê dinyayê girt endamê Qomîta Nawendî û nonerê ewropa yê vê partîyê bu.

Mamostayê mezin Cîgerxwîn di jîyana xwe da 10 caran aliyên dewletên kolonyalîs da hate girtin, lêdan û îşkence dît, çerxa zimê ser bedena wî jî gerî. Lê ew her tim serî bilind ma û mêrxasî berxwe da. Cîgerxwîn jîyana xwe da nêzikî 40 efirandin dan. Ji wan bîrdariyên berz heft; dîwanên mezinin: Dîwana Yekan 1945, Sewra Azadî 1954, Kîme ez 1973, Ronak 1980, Zend Avîsta 1981, Şefaq 1982, Hêvî 1983. Cîgerxwîn hemû perên lîteratura Kurdî da, zimanê Kurdî baş da şuxulandin. Wî bi xebatek hostetî xizmeta zmanê Kurdî kir. Nîvîskarên weku Cîgerxwîn ku zmanê Kurdî dihiltiya tîltîya maksîmum da dane şuxulandin zor kêmin. Li piştî Meleyê Batê (1417-1491) û exmedê Xanê (1651-1707), nîvîskarê herî mezin ku Kurdî baş, pak û zelal daye şuxulandin Cîgerxwîne. Gîhiştîna Kurdî merteba zmanên modern aliyê nîvîskarên weku Cîgerxwîn hatîye mezatê. Bê guman ked û xebata Cîgerxwîn di vî alîda hemuyan zêdetirê, tu nîvîskarek nîne ku, ewqas weku Cîgerxwîn xizmeta xwe bona zmanê Kurdî hebe.

Seydayê mezin ku hemu jîyana xwe bona şerê rizgarîya netewî ya Kurdistan, aşitîya dinê û mirovperwerîyê dabu; 22 Cotmeh 1984, sisê yê sibê, li Swêd, bajarê Stockholmê çavên xwe ji vê dinyayê girt. Îro Cîgerxwîn hemu navçeyên Kurdistan seranserî welat jîyana karker, gundî, rewşenbîr, pêşmerge, jin, kal û pîrên Kurdistan da bingêya xwe girtîye. Ew ne tenê bo xelkê Kurdistan, bona xelkên alemê yên din ji hevîye, sterka rizgarbun aşitî, biratî û dilsozîye ye. Em bi vê weşanin efirandina Cîgerxwîn nemir, dixwezin carek din li ber bîranîna wî îxtîrama xwe bigirin. Seydayê mezin Cîgerxwîn bê mirine...

DÎYARÎ

Ji xortê ko barê millet dane ser milê xwe, û bi dijwarî di nav tarîstana zor û setema dijminê Kurd ve bi gernasî derbas dibin. Ji wan gundî û cotkarê kodibin zor û setema kevneperstê Kurdistan'ê de, pişt xûz û گردانxwar, ji bo ko nanê zorakê xwe derxin, xebata destê xwe bi erzanî difroşin, sermayedar û xwedî gunda.

Ji bo wan gernasê ko di zindana de çavnêriya ben û darê dijmin dikin û bi gernasî di riwê dijminê xwînwar, setemkar de doza daxwazê Kurd û mirovanîyê dikin. Ji bo va tevare ez vê çîrokê bi dîyarî pêşkêş dikim.

CEGERXWÎN
Bêrût 1973

JÎ BO ZANÎN

Biborin, dema min ev çîrok çêkir, kevneperestê Kurd li Sûriya hevsarê rêzanî bi dest millet ve berda bûn.

Ji lewra me bawer dikir ko em dikarin bê sergêjî û bi hevre bighên hin doz, daxwazên xwe, lê mexabin ko ev bawerîya me çewt û şaş derket.

Ji ber ko ji nûve rahiştin darê xwe û bi hovîtî êrîşî me kirin. û (heçî hatgo: Qafûro birawo) lê weke ko hatîye gotin (ji deve ketîye hop, hop jê tê) ca, bere zanibin ko nema karibin milletê gernasê Kurd bi hop, hopê rawastênin û careke dî limê siwarbin. Herwekû hatîye zanîn ko ne bi zorê bî kevneperestê cihanê hevsarê rêzanîya milletekî bi hesanî bernadin, û nakevin nav rêza gundî pale û rencbera, ji lewra gereke milletê Kurd baş zanibî ko bê sergêjî, bê dijarî nikarî hevsarê rêzanîya xwe ji destê xwînmijê kevnaperest derxî.

Çawa ko hatîye gotin: (Dara ko mirov bi xwîna xwe av nedî, berê şêrîn nagrî.) û (Destê tirsoneka sînga sipî nabînî)

Ji rojhilat ve, serdarê cîhan.
Di nav çîyan ve, derket nagîhan.

Berê xwe da me, ji rojhilat hat.
Didî her kesî, azadî, felat.

Serê xwe hilda, tav da wa nava.
Ronî xwe berda, ser dar û ava.

Ez dil nexoşim, derketim ji mal.
Di xwazim, herim تنها, bê heval.

Çîya bi carek, rêl û daristan.
Hemî dagirtin, bax û gulistan.

Tîrêjê rojê, xwe berdane ser.
Rengîn bûne pel, kesk û sor û zer.

Dengê tenbûra, tîlûr û çema.
Katik anîne, govend û sema.

Ez rûniştîm, xweş bê deng û bê hiş.
Li hawîr teba digerin xişxiş.

Li çî di gerim? hawîr di nerim.
Bê çeng û perim, diwêm bifirim.

Çîya bûne Dêw, ji Xo di tirsim.
Hawîr dar û mêw, ji xwe di pirsim.

Ev rista xweber, ev dar û ev ber.
Kê wer saz kirne, ev rewş û hiner?

Em hemî candar, kê em anîne?
Kîne em, kîne, kîne em kîne?

Li hawîr, gul û çîçek û geya.
Di ser mera, pir bilindin çîya.

Şîpên avêne, diçin ber bi jêr.
Çuqlî di hêjin, sor û kesk û zêr.

Çirîk, çirîkin çivîk difirin.
Li hawîr candar, li hev digerin.

Ez xweş dikşênim, hilmê ji sorgul.
Xweş tê guhê min, awazê bilbil.

Hawîr min, rez û bustan û baxîn.
Sî û goyîn û kevok û zaxîn.

Di nav ava de, ordek û qazîn.
Li ser latan, xweş şahîn û bazîn.

Ketim gomana, sawîrên di kûr.
Hişê min derket, di gerî û li dûr.

Derbas kirin wî, çend xêz û sînor.
Hawîr di nerî, li jêr û li jor.

Xwe winda kirye, wer maye bê hiş.
Min di, pêjneke tê ji dûrve xiş, xiş.

Li xwe şîyar bûm, pêjne kêye tê?
Min dî, şepalek hate ser şetê.

Ebrû şevîne, bi civ şikestî.
Ji çavan dirjin, sistî û mestî.

Por kirye wek tac, sipî dest û zend.
Bejna wê bilind, pîr gewr û lewend.

Sîng û gerdên, wek berfa çîyane.
Du sêve soran, kiras hildane.

Kabîk bilinde, qundera di pî.
Di gorade, çîm xuyane sipî.

Bi sorgula re, bi dev di kenî.
Hatîye, berê dara di çînî.

Bi herdû çava, xweş lê dinêrim.
Di xwazim, sivik bi berde herim.

Weke me kewê, wê bigrim bi dest.
Dev û lêvdêm, ramûsim serbest.

Mîna da xwe, rabûm lê dil bi tirsim.
Li xwe hay di bûm, ji xwe di pirsim?

Ezê herim ku, ma qey ez hovim?
Belkî ew bê vir, e'jî mirovim.

Jinî wekî mên, xwedî bawerî.
Dibî li yek wek min, ew di gerî.

Lê min dî, şêrîn li min dûtî diçî.
Ez rabûm ser xwe, wek gurê birçî.

Goya, di xwazim herim bi gerim.
Bi herdû çava hawîr di nerim.

Di ser çîyan ve, diçim ber dara.
Car car di çinim, sêv û hinara.

Qadê didizim, da ez herim cem.
Çawa ez dîtîm, xwe berda ber çem.

Min zû xwe berda, ber perê avê.
Sîya dara çû, ketim ber tavê.

Kevok di firin, teba di gerin.
Ez û şêrîn, kûr li hev di nêrin.

Em herdû تنها, ji me dûre gund.
Li hawîr, lat û zenarin bilind.

Roja payîzê, lat kirne zêrîn.
Şalûl û bilbil li hawîr qêrîn.

Saz û awazê awê bi xum, xum.
Guhê min da girt, bi berve di çim.

Gîham cem şêrîn, dil bi tirs û xem.
Piştî xwe da min, berê xwe da çem.

Pozê w bilind, porê zer û zêr.
Mijgulên çavan, xwe berdabûn jêr.

Dengê xwe lê kir, dil bi xem û tirs.
Na çare jêre me gotî, çend pirs.

Roja te pir xweş, şebala perî.
Ji min çi di divê, li çi di gerî?

Berê xwe da min, bi dev kenek xweş.
Awir barandin, li dil çavê reş.

Go: Çitkî li vir, mirovî, canî?
Dêwê sê serî, li vir tu danî?

Ma kî di wêrî, ji tirsaxa.
Serbest bi gerî, li nav va baxa?

Wesa xuyaye, ji kes na tirsî.
Serbest tê nik min wesa di pirsî.

Ma qey nizanî, ev bax û bustan.
Ev şax û ev av, hemî daristan.

E mala axê, axayê navdar.
Hasin bi sarî di cûyî, xwîn xwar.

Di çavê wîde, tim agir û pêt.
Xwîna milletê Kurd, wî hemî mêt.

Dijminê millet, rencberê neyar.
Bi xwîna millet, şîn kirin ev dar.

Babê mine lê nezan û xwîn xwer.
Dane ber linga, gundî û rencber.

Her dem talan û kuştin û şewat.
Xwînê sor kir, ev zinar û lat.

Bê xwendin hiştin, hemî jin û mêr.
Sindoq dagirtin, ji dînar û zêr.

Di bin destan de, çend hezar gundin.
Ji nav tevan, bes ez dame xwendin.

Lê îro çibkim, ev gund û bajar.
Xistin bin destê, dijmin û neyar.

Çi karim bikim, ez jinim bê mêr?
Jin karî çibkî, meger bibî şêr.

Na xoş ketîye, bavê minê kal.
Zengîne, zengîn, ne jin ne mindal.

Ez tenê mame, li ber destê wî.
Siba ew bimrî, di mênim sêvî.

Milet xeyîd ye, lê nakî selav.
Na dî destê me, yek ji tasek av.

Ji ber ko, bûye hevalê dijmin.
Êrîş wî dikin, hemî mêr û jin.

Îro hê saxê, belkî newêrin.
Siba ko bimrî, wî na veşêrin.

Di xwazim, yekî gernas û zana.
Bidim destê wî, ez van rezana.

Meger xwenda me, lê wê çibkî jin?
Na xwazin, tacê bidin serê min.

Çend sal di nêrim, di gerim, hawîr.
Lê min hîç nedî, yekî wilo jîr.

Bidim destê wî, van gund û baxa.
Piştî babê min, ew bibî axa.

Bixin destê wî, hemî tac û dar.
Bijî di gel min, serdar û ser kar.

Sivik di gotin, ji min re ev pirs.
Di hêjyan lêv, dil bi xem û tirs.

Destê xwe da min, destê sipî nerm.
Xwe berda ye, ser herdû riwan şerm.

Berê xwe da min, koveka kedî.
Ji min di pirsî, bi şerm û fedî.

Go hêvî dikim, bêjim mexeyde.
Li cem me, siba şahî û eyde.

Eger di xwazî werî, herin mal?
Bi bênî, rewşa bavê minê kal.

Gelek hêjaye, belê ne xwendî.
Ji me dûr xistin mirov û gundî.

Belkî babê min, te bikî ser kar.
Bixî destê te, hemî ben û dar.

Navê xwe bêje, eger di xwazî?
Awir ji min, dan bi rind û nazî.

Bi ken min gotê: Navê min Salar,
Bi ken go: Fermo, herin bû êvar.

Min go: Ez benî, lê dev hew gerî.
Go: Bêje, çiman li min dinerî?

Min go: Dixwazim navê xwe bêjî,
Ji van lêvên sor, şekir birêjî.

Kenî, go: Navê xwe ez nizanîm.
Lê xelk dibêjin: Kesnedî Xanim.

Li min dinêrî, dilxweş û şahî,
Ji çavan dirjin, şewq û ronahî.

Min go: Navê rast bêje ka çîye?
Go: Te rast divê ezim Midîya.

Navê te xweşe, kevnare û rind.
Hemî ê we bûn, ev bajar û gund.

Navê babê te, çîye ez benî?
Bi yarî, dostî, bimin ra kenî.

Dev ji navê wî, berde bû êvar.
Sîya zinaran, xwe berdaye xwar.

Fermo em herin, zû bighêne mal.
Çav nêrê meye, babê minê kal.

Hawîr difirin, çivîk kesk û zer,
Çirîk, çirîka çûkan li her der.

Çilpîyên daran, zer bûne wek zêr.
Sîya zinaran, xwe berdaye jêr.

Sor û kesk û zer, bûne pel û şax,
Hilmê dagirtin, ew newal û çax.

Nêzîke we bê, bi ser mede şev.
Destê wê min girt kişande ber dev.

Min xweş ramûsa, gelek bunijtim.
Li ser çokên xwe, li ber runiştim.

Destê min kêşa ez rakirim zu,
Bi jorde hildam wê, herdû ebru.

Dema ez rabûm, gîhame ber dev.
Biskê ji miskê, li rû kirin şev.

Ketim gomana hemî reş û kûr.
Ne dem, ne cî man dî nêrim li dûr.

Destê xwe danîn li ser milê min.
Ji dil derketin derd û kulê min.

Bi xurtî min ew daye ber hembêz.
Dev û çav û dêm hemî kirin mêz.

Go: Bextê sipî ji ku tu anî?
Şahbalê perî li vir tu danî?

Min ji Xo çi xwest kete lepê min.
Destê min girt û kete çepê min.

Min qatuf ji dest wê girt û meşîn.
Sazên avêne xumîn û xwişîn.

Li ser avan re diçin em sivik,
Têne govendê çuqlî û şivik.

Çend gavan em çun qesrek sê derî,
Tîrêjên tavê mane li serî.

Çar qat û bilind, li hawîr Ebrac.
Di binya wê re çend malê Kurmanc.

Rengê kevnare her tişt da zanîn.
Kê ev nexweşî ji bo me anîn?

Li ser pişta kê ev bircên bilind,
Ava bûne xweş pîr ciwan û rind.

Gemara destê karker û cotkar.
Xweş bilind kirne ev kevne dîwar.

Li hawîr bax û bustane pir xweş,
Gul û nêrgiz û beybun hawir geş.

Em gihan ber der, li me bu dereng.
Pêjin ji nayê bê kes û bê deng.

Min gote, şêrîn ev çîya domam?
Ev birca bilind çawa bê xulam.

Go: Milet hemî xulam û ber dest,
Lê çibkim kalê babê mi ne xwest.

Xwînxwar û mêrkuj nezan û zorker,
Birçî hiştin tev gundî û rencber.

Navdare, axa bi zor û setem.
Mîrov û gundî hemî çu ji cem.

Él jê xeyîdye, gundî asê bûn,
Xulam û rencber hemî ji cem çun.

Pezê bê xwedî maye bê şivan,
Li vê birca ha kes nabî mêvan.

Nadin destê me kesek tasek av,
Ken û girî go: Ez keç û ew bav.

Çibkim jîna bê dost û heval,
Ko dil ne xweş bim, tif û zêr û mal.

Ev reng jîn çîye, naxoş û bê tam.
Di vê qesrê de ne dot ne pismam.

Em çune qesrê eywanek mezin,
Lê mirov têde her ew û ezin.

Qesrek bilinde li hawîr şênî.
Li birca jorî, pûmek dixwênî.

Mîdya ez birim oda bavê kal.
Ji ber jana dil dikî nale nal.

Ji biro derxist mersevek ji zêr.
Li ser danîne hin çetel û kêr.

Li ser mersefê hin sêv û xeyar.
Danîn ber bavê kal û yexteyar.

Kalo bi destan çend pirsan dibê,
Go: Werin herdû rûnin ser sifrê.

Mîdya gote min fermo rûne cem,
Belkî tu derxî ji dil kul û xem.

Mîn da xwe rabûm ez çûm bi nazî.
Gote min: Fermo rûne birazî!

Ez runiştim cem çi lê binêrim.
Mîn dî li hember piling û şêrim.

Awir vedan min pîrê kevneşêr.
Danîne ber min wî çetel û kêr.

Piştî xwarin me ew sêv û xeyar.
Ji nu peyivîn ji aş bajar.

Min dî axayê nexwendî, nezan.
Tuj û dijware wek kêr û cûzan.

Têne bîra wî çax û demên pêş.
Divê bistênî ji gundîyan bêş.

Milet birçîye lê hemî têr çek.
Di rojên pir teng siwar tên bi lek.

Di ber axê de hemî tên kuştin.
Navek pir mezin wan jêre hiştin.

Di ber axê de hemî diçûn şer.
Ew didan kuştin axayê xwînxwer.

Axa ne xwendî bi tac û sinbêl.
Ji hev perçe kir wî millet û êl.

Tev berdane hev kuştin û talan.
Gundên xwe berdan tev ketin çolan.

Lew mane birçî, tazî, pê rût.
Ji wan tije bûn Mûsîl û Bêrût.

Wê çibkin birçî na xwazin bimrin,
Li ser piştta xwe baran hildigrin.

Jinên pir ciwan bûne nav malî.
Naçare ji ber xwe dane alî.

Karker û cotkar destên xwe dan hev,
Hevdî dibênin bi roj û bi şev.

Ji hev re xwarin wan sûnd û peyman,
Hew bêşa didin axayê nezan.

Di rojên cejn û xweşî û şahî,
Li vir kom dibin tîp û alahî.

Gundî û gernas, siwar û leşker,
Bi rext û tiving di hatin ber der.

Kalo nexweşe lê pîr şiyare,
Ji min re dibê rewşa kevnare.

Sinbêl û ebru sipî bûne tev,
Pesnê xwe didî agir tê ji dev.

Ev kûçik çawa li ber min rabin,
Eger ez bimrim ewê dîl şa bin.

Lê ko ez rabim bi dar û qamçî,
Dîsan wan tevan bihêlim birçî.

Guh mede carek herim cem çawîş,
Bi çar qurişan wê saz bikî îş.

Benda gundiyan qet naçî serî,
Dîsan wê bêne ber devê derî.

Hemî aloz û pê xwas û tazî,
Tu guh didî wan pîsan, birazî?

Min lê vegerand bi tore û nerm.
Berê xwe daye bê tirs û bê şerm.

Min go: Li cem te şahî û eyde.
Ezê çend pirsê bêjim mexeyde.

Çiqas mezin bî, beg bî, axa bî,
Bi xwazî çibkî, bê minet na bî.

Êrîş bikin ew li ber derê te.
Ev tac namênî li ser serê te.

Ew jî wekî we dixwazin şadî.
Divên serbestî, gerdên azadî.

Wekî we ew jî tev mêr û merdin.
Ew jî wekî we Mîtan û Kurdin.

Ewin çêkroxên van rez û baxa.
É wek te kirin li ser xwe axa.

Di rojên tengî şêrin li meydan.
Welat ji wanre we kirye zindan.

Bese van şêran ji bendan berdin.
Ew jî wekî we Mîdî û Kurdin.

Ev çi zencîr û çi bend û qeydin.
Mehêlin ji we ji dil bi xeydin.

Gelek hêjane navdare Kurmanc.
Wan da serê we ev kulah û tac.

Kê ava kirin ev xanên bilind?
Kê pêk anîne ev bajar û gund?

Ma kê rakirye ev çol û beyar?
Kê xwedî kirne ev bax û gulzar?

Bese jîyar bin ji xew dilovan.
Bibin wek bira axa û şivan.

Rê bidin mîlet bere şîyar bî,
Ta kengî wesan kê m û hejar bî.

Ji xortên nûre çêkin xwendegah.
Da zû şîyarbin bibin bi agah.

Hêvî dikim çê guh bidî peyvê.
Wa xelk bi sarûx gîhane heyvê.

Ta kengî Kurdê bindest û bê nan.
Ji dijminan re şivan û gavan?

Di nav mede bin ev jan û mirin.
Ji dijmin re em bara hilgirin.

Eger çiqas win navdar û merdin.
Ji ku hatine, ma qey ne Kurdin?

Kes mezin nabî bê êl û Welat.
Yektîya Kurde tilisma felat.

Ez wer dibêjim, Şêrin guh li ser.
Van gotinan tev distênî ezber.

Destê xwe da min axayê mezin.
Go, ez nizanim xortî ya bi jin?

Min go: Ez xortim nû hatî, xwenda.
Ez ne axame, Kurmancê gunda.

Go: Ez pîr bûme nexweş û bê kêr.
Ma hêjane çi ev sera û zêr?

Ezê te bikim serdarê welêt.
Tim qencî bike hingî ji te bêt.

Ez poşman bûme min berda û çû.
Dibên: Te berda êdî mede dû.

Keça xwe da te bibin jin û mêt.
Mîn sipardin we ev mal û ev zêr.

Pîroz bî li we ev cîhana xweş.
Salê min ghan sed û bîst û şeş.

Karê min bû her, talan û setem.
Hatin guhartin îro çax û dem.

Weke ko te got bê xwendin û kar.
Milet dimênî birçî û hejar.

Ji bo min divê gorek kûr û teng.
Bere bighê te, ev şapal û şeng.

Bi hevre bijîn herdû dilovan.
Li ber qesra min bibin dergevan.

Te pir dîtîye derdê xizanî.
Naxwazim bêjim tu çêtir zanî.

Da serê Mîdîya taca xweya zêr.
Pîroz bin li hev bûne jin û mêr.

Destê xwe da min nazdar û ciwan.
Şekir şikandin lêvên erxewan.

Ez birme qata bilind û banî,
Her tişt ji mire kirin xuyanî.

Ketin odakê xweş û wek bihişt.
Têde danîne çêkroxê her tişt.

Textek têdaye ji zêr û gewher.
Doşek û perde ji sorê mexmer.

Li ber dîwaran bi rêzin kursî.
Şêrîn gote min, ji min di pirsî?

Ev oda teye, tevlî min û text.
Te text divêtin, min jî divê bext.

Min lê dinêrî raste kes nedî.
Min da ber sîngê kevoka kedî.

Şev kete ser me, roj çûye ava,
Di qesrê de em bûn, bûk û zava.

Ji xew em rabûn min go: Kesnedî.
Were ez bêjim xewna ko me dî.

Go: Xêr bî xewna kò te dî bêje,
Şekir ji lêvên xwe zû bi rêje.

Min go: Kesnedî şeva dî min dî.
Ji qesrê der çun di bune gundî.

Hawîr di gerîn, em dil xweş û rind.
Di dane millet me ev mal û gund.

Di nav wan de em dibûn bi rûmet.
Li dar dixistin millet hikumet.

Wan taca zêrîn didan serê te.
Hemî di hatin li ber derê te.

Di kirin gazî, bi qîr û lîlan.
Di hatin sema, govend û dîlan.

Me ava kirin gelek zanîngeh.
Tanîn nav welêt bê jimar dezgeh.

Hate riwê min, Mîdya û zû got.
Bese xewna te hinavê mi sot.

Ez îro bûme jî bo te bin dar.
Ez te di xwazim, çîye ev gemar?

Kanî birjênî, berdî nav avê?
Îdî ew zor û setem, me navê.

A çê ewe ko, em herdû herin.
Gund, bi gund li nav millet bi gerin.

Qadê bi din wa hemî wekî hev.
Bi vî rengî em wan bighênin hev.

Ji wan rê vekin, em nexweşxana.
Têde xwedî kin Dektorên zana.

Ji zarokan re vekin xwendegêh.
Bere zû rabin, ji ser me guneh.

Ji wan derkevin xortên xwendewar.
Bi xî destê xwe ew ben û hevsar.

Dezga vekin em li her der û cî.
Bela nemênin tazî û birçî.

Welat bi carek bikin karava.
Serbest bijîn tev, bi roj û şeva.

Firoka çêkin, firokên mezin.
Bi hevdi şa bin, hemî mêr û jin.

Bere nemênin kîn û berberî.
Serbest bî mîlet ji hev bi gerî...

Min go: Pir başe, Kesnedî xanim.
Tişteke nemaye, ko pê nizanim.

Belkî bavê kal nebêjî erê,
Çawa derkevin, ez û tu ji rê?

Ma kalê ne go: Çibkî di karî.
Ji ser milê wî rake vî barî.

.....
.....
Sibê em rabûn, herdû bûne cot.
Em gihane kê, me ev jêre got.

Dilê wan xweş bû, bûn heval û dost.
Me qad belav kir li wan bost, bi bost.

Zevî û avî hemî bax û rez.
Xanî û pere tev, sewal û pez.

Şevreş li ber wan tev bû ronahî.
Kete nav milet, govend û şahî.

Welat bi carek bûye xwendegah.
Gavanê gunda, bûne weke şah.

Berdan ser qadê, Dicle û Ferat.
Welatê me bû, bûka rojhilat.

Li ber destê me, petrol bû bi zêr.
Kes birçî nema, hemî bûne têr.

Di bîst salan de tiştek kêr nehişt.
Welat seranser, hemî bû buhişt.

Ne zor, ne setem, ne şêx, ne derew.
Li ser zinaran, bû qeb qeba kew.

Trên li her der, li deşt, li çîya.
Her der bû bihar, bilind bû geya.

Rê bûne şose, otmobîl li ser.
Nema kes dixwî, axîn û keser.

Vebûn li her der bar û sînema.
Koça xwe bar kir, kulan û xema.

Ketin nav welêt şahî û xoşî.
Mala xwe bar kir zû bê qidoşî.

Di xwendinê de bûne pehlewana.
Hemî jin û mêr, tev rind û ciwan.

Her ro şahîye, dîlan û tevger.
Îdî me nehişt, rêçek ji bo şer.

Hemî bûn heval, tev dost û bira.
Belengaz hemî bûn xwedî pera.

Kete dest millet hemî dar û ben.
Bûne weke hev, paşa û reben.


Li me pîroz bûn, hemî çax û dem.
Ketin bin qadê tev, zor û setem.

Dil xweş dijîn em, ez û Kesnedî.
Îdî ev çîrok li vir di qedî.

Î sal hezar û nehsed û heftê,
Min ev dasîtan, xiste ber qeftê.

Jîna min heftê, li ser we digrîn.
Ji lew navê min bûye **CEGERXWÎN**.

Kes mezin nabî bé él û wela Yekîtiya Kurde tilisma felat



CEGERXWÎN

Gelek hêjane navdare Kurman
Wan da serê we ev kulah û tac.

Kê ava kirin ev xanên bilind?
Kê pêk anîne ev bajar û gund?

Ma kê rakirye ev çol û beyar?
Kê xwedî kirne ev bax û gulzar?

Lî ser piştê kê ev bircên bilind,
Ava bûne xweş pir ciwan û rind.

Gemara destê karker û cotkar,
Xweş bilind kirne ev kevne dîwar.